



# HÎLBÎJARTÎNÊN KURDISTANÊ PROSEYEKE DEMOKRATÎK Û ÎROYÎN BÛN

**Sekreterê Giştî yê PDKÎ  
Mistefa Hicrî, bi hinceta  
serkeftina proseyê  
demokrasiyê li Herêma  
Kurdistanê du peyamên  
pîrozbahiyê pêşkêşî Mesûd  
Barzanî û Celal Talebanî kir.**

Bi hilkevta bi dawî hatina  
proseyê Hilbijartinên Serokatiya  
Herêma Kurdistanê û  
Parlamena Herêma Kurdistanê,  
Sekreterê Giştî yê PDKÎ du  
peyamên pîrozbahiyê ji  
rêzdarên Mesûd Barzanî, Serokê  
Herêma Kurdistanê û Celal  
Talebanî Sekreterê Giştî yê  
YNK'ê re şand. Deqa wan  
peyaman di vê hejmara Agirî de  
bixwînin.



## Pirsa Kurd Dibe Mijara Germ Ya Rojeva Siyasî a Turkiyê



Di çend rojên borî de Pirsê Kurd û rêyên çareseriyê wê doza netewî bi germî û  
berfirehî kete rojeva siyasî a Turkiyê. Çend berrisparên Hikûmeta AKP'ê di van çend  
rojane de daxuyaniyên balkêş dan û derbarê çareserkirina Pirsê Kurd axivîn û  
desnîşan kirin ku Turkiyê dixwaze bi paketeke nû gavên tazetir ji bo çareseriyê Pirsê

Kurd li Turkiyê bavêje.

Serokwezîrê Turkiyê Recep Tayyip  
Erdogan roja çarşem, 5'ê Tîrmeha 2009'an li  
gel şandeke DTP'ê bi serokatiya Emed Turk û  
hinek parlamenterên DTP'ê seetkê civiyan.  
Her dû aliyên civînê û mijarên rojeva civînê  
anko Pirsê Kurd giring nixrandin. Ev demek  
bû DTP'ê dixwest bi Erdogan re bicive, lê her  
carê bi hêcetê Serokwezîrê Turkiyê red  
dikir ku bi DTP'yan re bicive.

Wezîrê Karê Derve yê Yurkiyê, Ehemd  
Davutoglu û Wezîrê Navxwe yê Tikiyê Beşîr  
Atlay jî di çend rojên borî daxuyaniyên giring  
derbarê Pirsê Kurd dan çapemeniyê û li ser  
çareseriyê doza Kurd tekez kirin.

Partî û rêxistinên siyasî û sivil ên Kurd  
pêşwaziyê ji van gavên hikûmeta Turkiyê  
dikin.

### Komara Diz û Derewînan

Beşa 4 û dawî

5



### Ciwan û Hilbijartin

4



### Hêvî

9



sha

# Daxuyaniya Deftera Siyasî ya PDKÎ derbarê zêdebûna zextên rejîma Komara Îslamî ya Îranê bo ser xelkê Kurdistanê, piştî girevgirtina 22'ê Pûşperê

**H**ewelatîyên rêzdar!  
Civatên xebatkar yê xelkê Kurdistanê!

Kom û komeleyên mirovhez!

Partî û aliyên siyasî ên azadîxwaz yên Îranê!

Piştî ku xelkê Kurdistanê di roja duşem, 22'ê Pûşpera 1388'ê Rojî (13'ê Tirmeha 2009), bi hilkevta bîstemîn salvegera terorîkirina Dr. Qasimlo Sekreterê Giştî yê PDKÎ û hevalên wî li Vîyanê bi destê terorîstên rejîma Komara Îslamî a Îranê, gireveke giştî birêve bir û dikan û bazarên xwe girê dan û bi vê helwesta xwe ya neteweyî û azadîxwazane careke din emegdariya xwe li hember wî rêberê navdar nîşan da û kerb û nefreta xwe ji terorê û biryarderên wê kiryara terorîstî xuya kirin, Rejîma Komara Îslamî û hêzên serkutker ên wê bi awayekî berfireh li seranserî Kurdistanê dest bi girtin û zîndanîkirina keç û xortên azadîxwaz ên Kurd kiriye û heta niha dehan kes binçav kirine ku ji çarenivîsa wan tu nûçe û



zanyariyek di ber dest de nine û hevdem digel van siyasîyên dijî mirovî dest bi plompkirina dukanan kiriye û bi vî kar û kiryara nemirovane jiyana û tenahiya civakî a xelkê wek siyaseteke herdemî xistiye metirsiyê.

Lewra em daxwazê ji kom û komeleyên afigirên mafê mirovan û sazîyên navneteweyî ên parêzer û berevankerên

mafê mirovan û rêxistinên siyasî ên Îranî û Kurd dikin ku li hember wê pêla girtin û zîndanîkirina keç û xortên azadîxwaz ên welaê me û ew zext û zordestiya li ser xelkê Kurdistanê dimeşe helwestê bigrin û givaşê bînin ser wê rejîmê ku dest ji riftarên xwe yê dijî mirovî li hember xelkê Kurdistanê û azadîxwazan berde û bêdengiya li hember wan riftarên rejîma Komara Îslamî a Îranê dibe sedema berdewambûna rejîmê li ser van siyasîyên nemirovane. Herwiha em daxwazê ji xelkê welatparêz yê Kurdistanê û keç û xortên xebatkar ên Kurd jî dikin, her wek we bi yekîti û hevgeriya xwe di 22'ê Pûşperê de nîşan da xwedî helwestê û seha şoreşgerî ne, yekgirtiyane derfetê nedin hêzên qirker ên rejîma Komara Îslamî a Îranê ku bêhurmetiyê bi kesayetiya keç û xortên Kurd bikin.

**Partiya Demokrat ya Kurdistanê  
Îranê  
Deftera Siyasî  
31.04.1388  
22.07.2009**

## Daxuyaniya Deftera Siyasî A PDKÎ Derheq Bûyera Kampa Mucahidîn Xelqê Îranê

► Demjimêr 3yê piştînivroya roja sêşem, 28.07.2009an, hêzek mezin ku çend yeke ji Artêşa Îraqa Federal pêk hatibû, Kampa Saziya Mucahidîn Xelqê Îranê, di parêzgeha Diyala Îraqê dorpêç kir û heta teqe ji akinciyên vê kampê kirin.

Di encama vê teqekirin û pevçûnê de hejmarek ji akinciyên kampê hatin kuştin û pitir ji 200 kes jî birîndar bûn.

Ev kiryara Artêşa Îraqê di demekê de hatiye encamdan ku ew kamp li jêr çavdêriya leşkerê Îraqa Federal bixwe de bûye û erkê parastina akinciyên wê kampê bi wê hêzê hatibû sipartin.

Lewra kiryarek bi wî awayî, dûr ji çavniherî û rê û cihên navneteweyî û berevajî yasayên mirovî tê berçav ku derheq hejmarek zaf ji opozîsyona Îranê hatiye encamdan.

Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê ev kiryara hêzên Îraqê bi karek nerewa û kirêt dizane ku çî hêcetek di vê derbarê de nahê qebûlkirin û hêvî dike ku Saziya Neteweyên Yekbûyî û Rêxistinên parêzerên Mafên Mirovan û Mafên Koçberan bi giştî û hêzên hevpeyman bi taybetî, li hember kiryarek wiha hewlestê bigirin û bi armanca pêşgirtin ji encamdana kiryarên wiha ên nerewa û ducarbûna wan, gavên hewce pavêjin.

**Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê  
Deftera Siyasî  
29.07.2009**

## Êrîşa Ser Kampa Eşrefê Zengêkî Metirsîdar E Bo Ser Opozîsyona Rejîma Îranê Di Îraqê De

► Artêşa Îraqê roja sêşem, 28.07.2009'an, êrîş kir ser endamên Saziya Mucahidîn Xelqê Îranê. Di vê êrîşê de çend kes ji endamên vê saziyê hatin kuştin û bi sedan kes bi xurtî birîndar bûn. Herwiha bi dehan kes ji akinciyên Kampa Eşref ji aliyê Artêşa Îraqê ve hatin girtin.

Saziya Mucahidîn Xelqê Îranê di sala 1964'an de, bo xebat li dijî rejîma

Paşayeti a Îranê hate damezrandin.

Ev sazi di sala 1980'an de, kete ber êrîşa rejîma Komara Îslamî ya Îranê û di destpêka şerê navbera Îran û Îraqê a di sala 1987'an

de, di axa Îraqê de cihgir bû. Kampa Eşref di sala 1987'an, ji aliyê dewleta Îraqê ji bo cihgirbûna endamên Rêxistina Mucahidîn Xelqê Îranê hate avakirin.

Ev kamp di Rojhilata Parêzgeha Diyala a Îraqê û li nêzikê sînorê Îranê ye û li gor gotinên berpîrsên Îraqî pitir ji 3400 kes ji endamên Rêxistina Mucahidîn tede cihgir in.

Kampa Eşref piştî êrîşa hêzên hevpeyman, bo ser Îraqê di sala 2003'an de, kete bin çavdêriya hêzên Amerîkî, lê kontrolkirina vê kampê di dawiya havîna 2008'an kete bin kontorola hêzên Îraqê.

Endamên Mucahidîn di Kampa Eşref de, ji sala 2003'an ve hatine bêçekkîrin û bi tevahî ketibûn bin çavdêriya hêzên Amerîkî û pitir jî hêzên Îraqê.

Dewleta Îraqê daxwaza daxistina Kampa Eşref û çûne derveyî endamên Mucahidîn Xelq di vî welatî de dikin.

Herwiha Komara Îslamî a Îranê daxwaza derxistina endamên Mucahidînê di Îraqê de û radestkirina wan ji aliyê dewleta Îraqê bo Îranê kiriye.

Piştî vekîşiyana hêzên Amerîkayî li bajarên Îraqê û li gor qonaxa yekem a peymannameya ewlekerî a di navbera Îraq û Amerîkayê de, derfetek baş û bi cî bo her du dewletên Îraq û Îranê pêk hat ku pîrsa Mucahidîn di axa Îraqê de yekalî

**Dom Di rûpela 6'an de...**



# Xatemî Li Hewla Xapandineke Din



**Azad Kurdî**

Axavtin û  
daxuyaniyên  
Mihemed Xatemî,  
Serok Komarê berê  
yê bi nav  
Reformxwaz ê

rejîma Komara Îslamî a Îranê di civîna roja 28ê Pûşpera îsal de bi malbatên girtî û bê serşûnkiriyên xwenîşandan û bûyerên piştî şanoya Hilbijartinên Serkomariya Rejîma Îranê, bû mijara rojevê û ji aliyên corbitor ve hat şirovekirin û dahûrandin. Di wê hevdiştinê de Xatemî daxwaz kir derbarê rewayiya dewletê rapirsî bê kirin û baweriya ji dest çûyî a xelkê li hember desthilatê were vegerandin û ew cew û atmosfera aloz û kirîza xurt ku piştî hilbijartinên gera dehem a Serok Komariyê rûbirûyê rejîmê bûye kêmbike û sistema Wilayeta Feqîh a xwe rizgar bike.

Bi awayekî giştî Rapirsî an Referandom, dengwergirtina rasterast ji hemû endamên pêkîner ên welat, civat û rêxistin û organîzasyonê ye ku ji bo red an pejirandina siyasetekê ku serok an nûneran pêşniyar kiriye û xelk bi vî û îradeya xwe bê separendina ra û dîtinek taybet deng bi mijara rapirsîyê didin û prose tê rêvebirin. Di sistêmên siyasî ên cîhanê de Referandom bi mekanîzmên corbitor rêve diçe. Lê di welatên demokratîk û ne demokratîk de rapirsî bi tavahî li hev cuda ye.

Li gel wê yekê ku heta niha 3 car ji aliyê Komara Îslamî a Îranê ve referandoma nimayîşî, dasepandî û ne demokratîk derbarê pejirandina Qanûna Bingeîn û Rapirsîya Giştî ji bo pergala Komara Îslamî li sala 1980an û cara sêyemîn jî bo guhertinên berçavgirtî ên konseya pêdeçûnkirina Yasaya Bingeîn li pey mirina Xumeynî di sala 1989an de hate lidarxistin, lê hê mifahstandin ji têgiha referandomê di Sîstema Wilayeta Feqîh de taboyeke siyasî tê hesibandin û zelalî li kar û mekanîzmên wê di civaka Îranê de tune.

Daxwaza Mihemed Xatemî bo rapirsî derbarê rewayîdan bi dewleta Ehmedînejad, zêde wek senaryoyeke xapîner a din ya wî û derûdor û hevberên nabirî bo pêkanîna aramî û dirêjkirina temenê Sîstema Wilayeta

Feqîh û derbaskirina dubare ya rejîma Komara Îslamî ji wê kirîza navxweyî xwe dixwe rojevê ku ji aliyê xelkê ve rûbirûyî pêleke berfireh û bêminak a nerazîbûna xelkî bûye, bi taybet li pey şanogeriya dehemîn dewra Hilbijartinên Serkomariyê ku wek erdhejêkê reh û rîşalên Wilayeta Feqîh hejand.

Em dikarin armançeke din a Xatemî û partiya wî ya formalîte wê yekê bizanin ku ji ber tirsê sûça pêkhateşikênîyê ji xwe dûr bikin û wek dewrana heşt saliya Serkomariya xwe tu gavek bo bersivdan bi dengê xelkê û alîgirên xwe neavêt. Wê demê jî ku hebûn û rewayiya rejîma wî diket metirsiyê, xwe ji rastiyan derbas dikir û ji bo navbirî û hevber û hevberên wî re herdem parastina sistêmê giring bû heta dengê nerazî yê gel û bînpêkirina maf û azadiyên civatên xelkê.

Giringtir ji hemûyan, qanûn û dezgehên rejîma Komara Îslamî bi awayekî hatine dariştin û endazyariyêke wilo dîktatorane ji wan re hatiye kirin ku tu guhertineke demokratîk tê de pêk neyê. Bo minak, derbarê pêşniyaza Xatemî ya jî bo Referandomê, esla 110 a Qanûna Bingeîn destnîşan dike ku derkirina fermana rapirsîkirinê ji aliyê serokê olî ve dibe, lê me dît ku Xamineyî çend caran û bi çî awayekî pesna hilbijartinên gera dehem a Serkomariyê kir û ew wek proseyeke paqij û encama wê jî ber dilê xelkê zanî, heta bi tundî gef ji xelkê nerazî yê ku ji ber sextekariyê di hilbijartinan de serî hildabû, kir. Herwiha esla 59 a Yasaya Bingeîn a Komara Îslamî a Îranê dibêje, di pirsên siyasî ên giring de bi erêkirin û razîbûna du ji sêyan a Nûnerên Meclîsa Şewra Îslamî dikare Referandom bê kirin.

Ger em di çarçoveya fikr û xeyalên Xatemî ji bo Referandoma Yasaya Bingeîn ji pirsê binerin, bi awayekê ku dixwaze bi xistne rojeva wê mijarê dest dane ser xala lawaz û qels ya aliyê beramberî xwe ku ew jî rewayiya xelkî a wan e û bi wê yekê nerastbûna 24 milyon dengên sexte ji raya giştî re nîşan bidin, lê ji aliyekî din ve Xatemî û hevberên wî bi başî şarezayî li ser pêkhateya hiqûqî a Qanûna Bingeîn a rejîma Wilayeta Feqîh hene. Bêguman Meclîsa Şewra Îslamî vî karî encam nade, eger Meclîs jî amade be wî karî

bike, Konseya Nobedar ya Yasaya Bingeîn astengeke mezin a din e ku dengê jê re nede, heta ger ev du dezgehên hikûmetê jî rizamendî li ser hebin, Rêberê Olî bi tu awayekî naçe bin barê wiha biryarekê, ji bilî van kospane çendîn astengên din ên pêkhateyî li pêşiya çibîckirina biryareke wilo di Komara Îslamî de hene. Lewra ji sî salan berî niha ve fikir û endazyariya tekûz jê re hatiye kirin û hemû rê girtî ne, ji ber ku sistêm daxistî û hişk e.

Anîne rojeva van mekanîzmane ji aliyê Xatemî û derdorên wî, xwe veşartin ji rastiyan nav sistêm û



pêkhateya ne demokratîk a rejîma Komara Îslamî û qanûn û dezgehên wê ye ku tu rewayiya xelkî nemaye. Rayedarên wê hikûmeta Îslamî dibêjin Wilayeta Feqîh û sistema wê rewayiya xwe di bingeh de ji xwedê werdigre nek ji xelkê. Îdeolojiya Wilayeta Feqîh bi vî awayî dinere pêwendîya navbera sistema xwe a hikûmetî û xelkê. Ji ber ku li dêlva wan dengê xelkê nerazî û banga azadî û demokrasîxwazî û berçavgirtina mafê mirovan ji aliyê

xelkê û kom û komeleyan bê nîrx e.

Rewşa ku Îrana îro têde derbas dibe û rexne û nerazîbûna berfireh a xelkê ku berçêla Xamineyî û sistema wî girtiye, encama sî sal desthilatdariya gendel a siyasî û dîktatorane, înkarkirina nasnameya netewî a gelên Îranê û ne berçavgirtina mafên demokratîk û mirovî ên wan, serkut û zordarîkirin li ser tex û qatên xelkê û bêparkirina civakê ji xweşiya azadiyên demokratîk û vemirandina çirayê ronahîker ê demokrasîyê ku daxwaz û

xweziya hemû civatên xelkê welat e.

Dîrokê selimandiye ku dîktatorî sistemek baş û guncaw ji bo civaka mirovahiyê nine û demokrasî şewaza herî kêmnirx û biha di serdemê niha de ye û îro di cîhanê de ê bûye nirxeke bilind û gelemperî. Xwe veşartin ji wê

eslê û domandina bînpêkirin, dîktatorî û zordestiyê û dijberîkirin bi sîstema nû a cîhanê re, tûşbûn bi çarenivîsa rejîmên wek Bees a Îraqê ye.

Li gor şiroveya karnasên siyasî, pir dijwar û zehmet e li gel hebûna van hemû astengên yasayî ku pêkhatiya

sîstema nedemokratîk a Wilayeta Feqîh dagirtiye, derfeta referendom yan rapirsîkirina giştî di çarçoveya Qanûna Bîngehîn de çêbibe, ew jî li ser kêmkirina desthilata Konseya Parêzvan ku yek ji organên sereke yê wê rejîmê ye û derbasbûn ji wê tê wateya bazdan ji Wilayeta Feqîh.



**Sekreterê Giştî Yê PDKÎ Peyamek Pîrozbahiyê Ji Bo Mesûd Barzanî Şand**




Rêzdar Mesûd Barzanî, Serokê Herêma Kurdistanê!  
Silav û rêz

Bi hinceta hîlbijartina cenabê te wek Serokê Herêma ji aliyê xelkê Kurdistanê ve, herwiha serkevtina Lîsteya Kurdistanî di vê hîlbijartinê de, ez pîrozbahiyê xwe û rêberiya PDKÎ pêşkêşî we dikim û ji rêya cenabê te ve pîrozbahiyê ji hemû xelkê Kurdistanê dikim ku bi rêvebirina proseyeke demokratîk û pêşkevtinwazane û herwiha bi beşdarbûna xwe a çalakane di hîlbijartinê de, rûçikek hemdem û îroyîn nîşanê cîhana derve dan û carek din kêrhatîbûna gelê Kurd, bona birêvebirina kar û barên xwe nîşan dan.

Bê guman bawerî bi dengê xelkê û hest bi berpirsiyariya xelkê, erkê ser milê we yê birêz li xizmet bi gel û nîştiman girantir dike. Bo cenabê te û Lîsta Kurdistanî û gişt lîstên nû ên beşdar di Parlemana nû a Kurdistanê de, hêviya serkevtinê di birêvebirina wî erkê girîng û xizmetkirin bi gel û nîştimanê bi hêvî dixwazim.

**Partiya Demokrat a Kurdistanana Îranê**  
**Sekreterê Giştî**  
**Mistefa Hicrî**  
**29.07.2009**



**Sekreterê Giştî Yê PDKÎ Peyamek Pîrozbahiyê Ji Bo Celal Talebanî Şand**



Rêzdar Mam Celal  
Sekreterê Giştî yê Yekîtiya Nîştimanî a Kurdistanê!

Digel silav û hurmetan

Pêvajoya hîlbijartinê Serokatiya Herêma û Parlamena Kurdistanê bi awayekî aram û demokratîk pêngaveke berçav û dilxweşker bû ji proseya demokrasiyê di Kurdistanê de. Bi vê hincetê û bi boneya serkevtina Lîsta Kurdistanî, ji aliyê xwe û rêberiya PDKÎ ve bi germî pîrozbahiyê ji we yê rêzdar û hemû xelkê Kurdistanê dikim û serkevtinê zêdetir ji bo gelê me hêvî dikim.

**Partiya Demokrat a Kurdistanana Îranê**  
**Sekreterê Giştî**  
**Mistefa Hicrî**  
**01.08.2009**  
**10.05.1388**

## Zext û zordariya li ser Kurdên Rojhilatê Kurdistanê dom dike

**H**er ku diçe, zext û zordariya li ser gelê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê ji aliyê hêzên çekdar û dezgehên Komara Îslamî a Îranê zêde dibe. Hêzên Ewlekarî ên Sipaha Pasdarên Şoreşa Îslamî a Îranê, di proseyeke berfireh de, piştî gireva seranserî a xelkê Kurdistanê bi hilkevta 20emîn salvegera terorkirina Dr. Qasimlo û hevalên wî, heta niha bi dehan kes ji bazarî û çalakên yekîtiyên cur bi cur û xelkê sivil û çalakên siyasî, di çend bajarên Kurdistanê de binçav kirin.

Di çend rojên borî de dehan hevvelatîyên Kurd li gund û

bajarên Kurdistanê bi sedemên cuda cuda hatine girtin û binçavkirin û kesên girtî ketine ber lêpîrsîn û di bin zext û givaşên xurt ên ruhî û fizîkî de ne.

Çendî Kurd di çend rojên borî de bi sedema teqîna mayînan di çend bajarên Kurdistanana Îranê de hatin kuştin û birîndarkirin. Di gund û bajarên Rojhilatê Kurdistanê gelek mayînan hene ku berdewam goriyan digre.

Herwiha dehan Kasibkarên Kurd di yek du heftiyên borî de ji aliyê hêzên çekdar ên rêjîma Komara Îslamî hatin

kuştin û birîndarkirin. Eva di demekê de ye ku welatîyên Kurd ji ber bêkarî û xizaniyê bo debara jiyana xwe hatin û çûna sînoran dikin.

Roj nine Kasibkarek yan çend Kasibkarên Kurd li ser sînoran nehên kustin. birîndarkirin û airtin.



## RONÎ

Quncikek ji bo şiroveya bûyer û babetan ji xwendevanên "Agirî" re

Ebdullah Hicab



## Komara Diz û Derewînan

Beşa 4 û dawî

**P**êvajoya hîlbijartina gera 10hem ya Serok Komariya Îranê ji hîlbijartinên hemû caran cudatir bû. Cudahî ne di pilana kar an li şeweya diyarîkirina berendam û ne jî di taktîka nû ya dîmaneyên televîzyonê di navbera bernedaman de bû. Cudahiya vê carê di wê gotara siyasî de bû ku bi ser pêvajoya hîlbijartinê de bal kişand û li dawiya hîlbijartinê bû derfetek ji bo ku gelên Îranê dubare bêzariya xwe ji Komara Îslamî nîşan bidin.

Di wê navberê de helwêsta partî û rêxistinên Kurdistanê balkêş bû. Ji roja ku Komara Îslamî hate damezrandin û heya dema dawî, digel netifaqiyên ku di eniya Kurd de carna dihatin pêş, lê dîtinên hemû rêxistinên li ser şanosaziyên rêjîmê mîna hev bûn. Lê vê carê rewş guherî. Ji ber ku her çend armanca sereke ya hemû partî û rêxistinên opozîsyona Kurd yek be jî, lê gotara siyasî di pêvajoya hîlbijartina gera 10'ê ya Serok Komariya Îranê de weke 2 alternatîvên cuda ji hev kete rojevê.

PDKÎ û komek ji rêxistinên opozîsyona Kurd biryara baykotê dan. Beşê cudabûyî, Partiya Azadî û beşek ji kesayetî û rêxistinên civakî yên hundir helwêstek nerm nîşan dan û gel ji beşdariyê re teşwîq kirin. Gelo tu encam li her yek ji wan şeweyên siyasî derket, bi xwe mijarek cuda ye. Niha şanosaziya hîlbijartinê bi dawî bûye, netifaqiyên li ser encaman zelal in û berhema her yek ji siyasîtan di derheqa hîlbijartinê de hatibû ragehjandin derketiye holê.

Hem helwêsta baykotê û hem jî nermiya ku li ser hîlbijartinê hatî nîşandan, ciyê baldan û nirxandinê ne. Ya rast, di gel ku gelên Îranê û bi taybet netewa Kurd tu bawerî bi hîlbijartinên Komara Îslamî nîne û her ji destpêkê ve "NE" ya xwe gotiya Komara Îslamî, lê rêjîm bi zext û zorê û bi riya givaşan xelkê neçar dike ku di dema hîlbijartinan de herin ser siandoqan. Lewma baykotkirin ne ji rêjeya beşdariyê kêmtir dike û ne jî

encama hîlbijartinan ku pêştir hatiye kifşkirin diguhere. Tenê helwêstek li ser bingeha pîrensîpek siyasî ye ku mewdaya di navbera tevgera Kurd û şanosaziyên Komara Îslamî de nîşan dide.

Lê banga ji xelkê ji bo ku di hîlbijartinan de beşdar bin jî şaş e. Dema aliyek siyasî rêjîmekê bi hemû alî û pîvanên wê ve bi nameşrû dizane, êdî nikare ji xelkê daxwaz bike di çarçoveya wê rêjîmê de herne ser sandoqan û ji dengê xwe jî xwedî

### Dawiya hîlbijartinê bû derfetek ji bo ku gelên Îranê dubare bêzariya xwe ji Komara Îslamî nîşan bidin

derkevin. Ji ber ku hem deng çêkirî ne û hem pêvajoyê sextet ye.

Nayê înkarkirin ku hîlbijartin wek kanala herî bi bandor ji bo karê siyasî tê hesibandin. Lê dema ev kanal xetimî be û tenê wek şanoyek bê ruh bê bikaranîn, têketina li kanalê, di warê siyasî de şaş e. Lewma pêwîst e cudahiyek di navbera PÊVAJOYA hîlbijartinê û şanosaziya hîlbijartinê bi xwe de hebe. û bikaranîna pêvajoyê ji bo ku daxwaziyên siyasî pitir bikevin rojevê, zext bikeve ser berendam ku helwêstên xwe zelal bikin û mijarên ji

ser civakê danê. Weke çawa di dema Serok Komariya Xatemi de, bi kinî be jî hin zemîne ji bo hin xebatek berteng ya civaka medenî xweş bû, di wê dema dawî de jî tevgera Kurd dikarî pêvajoyê bi kar bîne û dengê xwe bigehîne pirr aliyan. Her çend astengî hebûn û encam jî weke dewrana Xatemi ne diyar bû.

Awirdana ji rewşa siyasî ya hundirê Rojhilata Kurdistanê di dema Xatemi de, renga ji bo nirxandina baştir ya rewşa demê alîkar be. Bi destpêkirina serdema Xatemi gelê Kurd bi hêviya ku Xatemi û paşan parlemana 6'ê, sozên ku ji bo guhertinan dabûn bînin cî, bi xurtî beşdariya hîlbijartinan kir. Bi wê yekê re hem hêviyek di nava civakê de ji bo guhertinan çêbû û hem jî berendamên hîlbijartinê cesaretek xurttir peyda kirin. Li hin deveran xebata hîlbijartinê bo cara yekê rengê siyasî bi xwe ve girt. Xelkê daxwaziyên xwe yên neteweyî dianîn ziman û berendamên nûneratiya gera 6'ê ya Parlemanê soz didan ku ji bo daxwaziyên xelkê kar bikin. Daxwaziyên kurdan zelal bûn; Peydakirina rêçareyek aştîyane ji bo Pîrsa Kurd ji rêya diyalogê, bi destxweve girtina rêveberiya herêmî, pejiwandina mafên kultûrî û siyasî, perwerdeya bi zimanê zikmakî û bi fermînasîna nasnameya netewî ya Kurd.

Dem hat, beşdarî di hîlbijartinê de

### Dema aliyek siyasî rêjîmekê bi hemû alî û pîvanên wê ve bi nameşrû dizane, êdî nikare ji xelkê daxwaz bike di çarçoveya wê rêjîmê de herne ser sandoqan û ji dengê xwe jî xwedî derkevin. Ji ber ku hem deng çêkirî ne û hem pêvajoyê sextet ye.

gel re giring bînin rojevê, dikare weke pêngavek di ciyê xwe de û meşrû bê bikaranîn.

Mixabin nakokiyên di hundirê tevgera siyasî ya Rojhilata Kurdistanê de, rê neda ku pêvajoyê bi durustî bê nirxandin û bikaranîn. Ji vê jî bi der, heta nehişt ku mijara baykotkirinê jî karigeriyê li

çêbû, lê ne parlemana 6 û ne jî Mihemed Xatemi tu sozên ku dabûn neanîn cî. Ji ber ku dema pêngavên piratîk ketin rojevê, çiyayê astengiyan bi ser daxwaz û hêviyan de verisiya. Hewlên Firaksyona Kurd a Parlemanê ji bo cîbicîkirina xalên 15 û 19 ya Yasaya Bingehîn ya Îranê ku rê dide gelên

welat bi zimanê xwe bixwînin û beşdarî rêvebirîya herêmi bibin, neketin jiyane. Her tişt di çarçoveyek şekli de ma û parlemanteran ji çend daxuyaniyên protestoyî li ser rewşa kurdên li Başûr û Bakûrê Kurdistanê bi der, nekarîn tiştêk piratîk bikin. Sîstemê rê neda ku heta di çarçoveya Qanûna Bingeîn a rêjîmê de jî nûnerên parlemanê ji bo kurdên welatê xwe karekî bikin.

Hewlên ji bo weşandina rojname an govarek bi zimanê kurdî li Parêzgeha Kurdistanê û beşdarkirina pisporên kurd di rêvebirîya bilind ya welat de jî negehîştin tu encamê. Sala 2001'an, parêzgarê parêzgeha Kurdistanê hate guherîn û waliyek din ji bo herême hate danîn. Nûnerên Herêma Kurdistanê li Parlemana Îranê dijberî nîşan dan û ji bo nîşandana dijberîya xwe roja 30 Kanûnê 6 parlemanterên Kurd îstifa kirin. Ne dengê wan hat bihîstin û ne jî îstifaya wan hate pejirandin. Heta ev nûnerên ku dixwestin ji bo kurdên sunnî yê rûniştvanên Paytext Tehranê jî mizgeftêk sunniyan ava bikin tu encam ji hewlên xwe negirtin. Lê pêvajoya wê serdemê, jiyane nû da tevgera sivil li Kurdistanê.

Niha piştî çend salan, ku dubare hewl hate dayîn ezmûnên bi ser neketî yê pêşîn dubare bêne ceribandîn, şaşitiya herî mezin, yek nebûna helwesta Kurd bû. Weke encama şanosaziya hilbijartinan jî nîşan da, tu fêdeyê banga ji bo beşdariyê tune bû, lê pêvajoya hilbijartinê derfetek bû ji bo nîşandana dijberîya bi sîstemê re. Weke çawan tevgera nû ev derfet bi kar anî. Niha pêvajoya siyasî li Îranê ber bi hindê ve diçe ku tu hêviya gelên Îranê û heta hêviya beşek ji karbidestên Komara Îslamî jî bi guhertin û çaksazî di çarçoveya Qanûna Bingeîn û Wilayetê Feqîh de nemîne. Lewma pêwîst dike ku tevgera guhertinxwaz, an ji bo guhertina sîstema Wilayetê Feqîh kar bike, an jî ji siloganên xapînok yê parastina pîvanên cumhûriyê dest hilbigre. Ji ber ku gelên Îranê pêwîstî bi piraktîzekirina Yasaya Bingeîn ya dij demokratîk nînin. Ya ku dikare Îranê ji rewşa niha xelas bike, rê veqetandin e ji rêjîmê û hewldana sîstematik e ji bo guhartina Qanûna Bingeîn.

Ji bo ku tevgera Kurdistanê bikaribe karîgeriyê li ser pêvajoyê bike, hin pêngavên lezgin ku rêzên tevgerê ji hev nêzik bike pêwîst in. Di heman demê de pêwîst e ku gotara siyasî ya Kurd xwe biguhere û zimanê lihevhatin û diyaloga neteweyî ciyê duruşm û helwestên derveyî eqlaniyê bigre. Bi wê pêngavê îmkân heye ku zemîne ji bo çêkirina platformek neteweyî a hevbeş bi beşdariya hemû alî û rêxistinên siyasî yê di meydana siyaseta îro ya Rojhilata Kurdistanê de pêk bê û dema ku tevgera Kurdistanê bi yek zimanî axivî, hem gel baweriyê digre û hem jî derfet ji bo karîgeriya siyasî li ser civak û siyaseta amade dibe. Tevgerê xurt û hevgirtî ya Kurdistanê, wê demê bi bawerî dikare deriyê diyalogê ji bo kesayeti û rêxistinên guhertinxwaz ku bingeha cumhûriyê û dengê gel diparêzin veke û eniya siyasî ya ku rastiyên siyasî, civakî û neteweyî li Îranê dixwe rojevê û hebûna gelan û cudahiyan li Îranê dipejirîne, xurt bike.

### Ji rûpela 2

...bikin.

Rejîma Komara Îslamî a Îranê jî pêşwazî ji êrîşa hêzên Îraqê bo ser Kampa Eşref kiriye. Di vê derheqê de, Elî Larîcanî, Serokê Meclîsa Şêwra Îslamî a Îranê got: "Herçiqas ku ev pêngava dewleta Îraqê dereng bû, lê cihê rêzgirtinê ye."

Bi gotina Ebdulrehman Mehabadî, berpîrsê ragihandina Mucahidîn Xelq li Îraqê, êrîşa sipaha Îraqê bo ser Kampa Eşref li bin çavdêriya Nûrî Malikî, Serok Wezîrê Îraqê û li ser daxwaza Xamineyî, rêberê Komara Îslamî a Îranê dest pê kiriye.

Mucahidîn Xelq, herwiha ragihand di êrîşa bo ser Kampa Eşref de gelek ji endamên Sipaha Pasdarên Îranê di nava Arteşa Îraqê de beşdar bûn.

Partî û Saziyên Kurdistanê ên li dijî rejîma Îranê, ku di Kurdistana Başûr de akincî bûne, kiriyara han a Sipaha Îraqê mehkûm kirin.

Êrîşa Sipaha Îraqê bo ser endamên çekkirî ên Mucahidînê, di kampa Eşref de, zengêk metirsîdar e bo ser partî û saziyên Rojhilatê Kurdistanê.

Êrîşek ku ger ji aliyê welatên Ewrûpî, Amerîka û Saziya Netewên Yekbûyî ve pêşî lê nehê girtin, renga di pêşerojê de tûşî binkeyên partî û saziyên Kurdistanê ên dijî rejîma Îranê jî bibe.

Mafê Mirovan

Nivîsin: Peter R. Baehr  
Wergeran: Mecid Heqî



## Rola Mafê Mirovan Di Siyaseta Dereve De

**E**ncam Tu guman di wê yekê de tune ku konsêpta mafê mirovan li gor rewşa siyasî û çandî ya welatan hatiye şirovekirin. Berê cudahiyeke di navbera "Rojava" û "Rojhilat" de hebû, bi wê wateyê ku welatên komonîst li dijî demokrasiya rojavayî bûn. Ji wê dema ku sîstema komonîst hatiye hilweşandin, cudahiya herî mezin di navbera welatên "Bakûr" û "Başûr" de, cudahiya di navbera welatên feqîr, paşvemayî û piranî welatên Asyayî û Afrîqî û dewletên pêşesazî yê Ewrûpaya Rojava û Amrîkaya Bakurî de ye.

Cudahiya navbera rojhilat û rojava bû hegerê pêkanîna mafên civakan di hember mafên takekes û îndîvîdualîzmê de, mafên aborî û civakî di hember mafên ramyarî û sivil de hat pejirandin û parastina serweriya siyasî ya netewî di beramber bihêzkirina desthilata navneteweyî de hatiye pesendkirin. Cudahiya di navbera Bakûr û Başûr de bû hegera bilindbûna mafê çarnivîsê, mafên gelan bi giştî û hegera wê yekê ku Peymana Mafên Mirovan ya Gelên Afrîqî bê û erka dewletan hember civakê û takekesan hat pejirandin.

Ew cudahî bê heger û di cih de nehatine pêş, lê bi derbasbûna demê wan jî geşê kirine. Bi wî awayî helwestê Yekîtiya Soviyeta berê beramber pîrsa mafê mirovan li serdema Stalîn bo Gorbaçov û niha jî serdema Borîs Yeltsînê serok Komarê Rûsiya hatiye guhartin. Di welatên rojava de mafên wek mafên aborî û civakî wek mafek siruştî tê dîtin. Herçend dîtin û nerînên cuda cuda hene û cudahiya fermîkirin û wergerandina mafan tê dîtin.

Di destpêka Carnameya Cîhanî ya Mafê Mirovan de hatiye ragehandin ku ew peymanê "bidestveanîna standardek giştî ye". Gîrîmana wê bi awayekê ye ku normên mafên mirovan cîhanî be û standardên Carnameya Cîhanî ya Mafê Mirovan bingeha wê be. Hê peymanek tewawgir ku çewaniya wan mafane şirove bike, nehatiye wajokirin, lê em dikarin li gel wê jî bêjin "pêkhatinek pêwîst" ku têde ew normên beşek li carnameya mafên mirov a cîhanî pêk tînin, dikarin bi awayekê baş bînin piraktîzekirin. Hêvî tê xwastin ew dîbat, beşdarî û pêkhatine bibin beşek pêwîst li rêzgirtin ji mafên mirovan li her derekî cîhanê.

## Ciwan Û Hilbijartin, Derfetek Ji Bo Guhertinê Yan Hêcetek Ji Bo Berevaniyê



**Arif Nadirî**

Serhejmariyên berdest nişanderê vê yekê ne ku civaka niha a Îran û Rojhilata Kurdistanê, civakek ciwan e.

30 sal bihesibînin,

Ger em sînore temenê ciwaniyê 30 sal bihesibînin, pitir ji %50 ji nifûsa Îranê ciwan in. Çîn û qatek ku nifşa piştî şoreşa sala 1979'an, ji dayîk bûne û hêvêna niha ya guhertin û sermayeya mirovî a welatê me ne. Komek ji Civaknas û bîrmend li ser vê rayê ne ku ew şoreşên siyasî ku piştî serkevtinê, ji aliyê girûpekî olîgarşî ve hatine qorixkirin û ji armancên xwe ên rastîn hatine dûrxistin, piştî guhartina nifşekê anku piştî 15 salan berbirûyê tirsî hilweşandin yan guhertina bingehîn dibin. Lê di Îranê de nişfa sêyem jî tê dinê, lê ev hêza mirovî a radîkal, seba nebûna organîzasyon û pilatformên hevpar ne tenê nebûna dînamîzma guhertinê, belku ji ber siyasatên desthilatê ên dijî hêvî û xwaziyan ciwanan, berbirûyê tepeserkirina hovane bûne. Teslîmbûnek ku xemsa û bê bawerî û sergerdaniyek siyasî lêketiye. Lewra em dibînin ku seba daxistbûna gişt deriyên berbirûyê wan, bi neçarî penayê dibin bo wan derfetên biçûk ku bawer in dikare îmkân û delîveyek be bona derbazkirina xwe ji zirûfa heylî. Yek ji wan, şanoya hilbijartinê ye ku dikarin têde manorê bidin û daxwazên xwe ducar bikin.

Helbet di Kurdistanê de rewş û zirûf ferq dîke û cuda ye û ciwanên Kurd seba hişyariya netewî amade nînin ku di fezayekî derewîn de rola kesên ku bazargermiyê dikin, bilîzin. Lê di asta Îranê de di heyamê 10 salên derbazbûyî de, Ciwanên Îranê seba negihîştin bi hêvî û çavnehêriyên xwe dixwastin di rêya şoreşek din de anka bi piştevanîkirin ji binav guhartinxwazan, aliyê kême beşek kême ji daxwazên xwe bi dest bixin, cimku çar sal ji Serokkomariya Ehmedînejad, ji bo texa ciwan pitir ji hemû çîn û qatên din, bixeter û



tirsna bû.

Lewra beşek ji ciwanan bona guhertinekî rûyekî daketin meydanê. Beşek ji ciwanan dixwastin bi hêceta hilbijartinê bêne ser xiyevanan û ger bo demekê jî be dîlan û şahiyê bikin. Qatek ji ciwanan jî ji zirûfa han bona berengarî tevî rejîmê mifah wergirtin, bê vê çendê ku kêmtirîn bawerî bi baskên rejîmê hebin. Piraniya kesên ku piştî encamên hilbijartinê, hatin ser rê û xiyavanan ji çîna han pêk hatibûn. Kesên ku bi bawer in divêt valahiya di navbera desthilatê de zêdetir bê berfirehkirin. Çimku ew pêla nerazîbûnê ne karê Mûsewî û ne karê Kerûbî bû, belku karê hinek ciwanan bû ku bi hêceta Mûsewî û Kerûbî û bi xweveşartin di pişt navên wan de, dirûşma mirin ji bo dîktatorê digotin. Ciwanan di rastî de hewil didan ku şerê guran bi guran bidin kirin.

Ji aliyekî din ve derfetek pêk hat daku xeşm û neferata nifşên piştî şoreşê derheq dîktatoriyetê diyar

bikin û hez û amadebûna xwe bona berbirûbûn tevî totalîtarîzmê û berengarîkirin ji azadî û kerameta mirovan bidin îsbatkirin.

Lewra film û wêneyên belavbûyî ji xwenîşanderên di nava şeqamên weke şeqamên Tehran, Şîraz û Îsfahan û ... de ev yeke eşkere kir ku ciwanên weke Nida Aqa Soltan, Kiyânûş Asa, Husên Tehmasîbî, Şîlêr Xizrî, Mistefa Xiyasiyan û... bi fîdakirina canê xwe rejîma Îranê xistne lerzê û bi çok de anîn.

Beşdarîkirina ciwanan di xwenîşandanên vê dawiyê de vê rastiye derdixin holê ku sîstema perwerdehî, civakî û siyasî a zal bi ser Îranê nekariye armancên desthilatê bidomîne û bi cih bîne. Lê aliyê nexweş yê vê pirsê eva ye ku nebûna organîzasyonêk bihêz a netewî di asta Îranê de bûye sebebê belavbûna netirsî û pitansiyela xebata ciwanan.

# Endamên Pêncemîn Kongreya YCDKÎ Li Ser Rojeva Kongirê Dipeyivin

Rapor: Şefih Rewşenî

► Roja pêncşem, 23.07.2009'an, pêncemîn Kongreya Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistanê Îranê, bi beşdariya nûnerên endamên vê saziyê li jêr navê "**Kongireya Hogirên Rêbaza Qasimlo**" û li jêr dirûşma "**Ciwanên Hişyar Ên Kurdistanê, Hêza Ronahiya Civakekî Pêşkevî Ne**" dest bi karên xwe kir ku piştî sê rojan karê berdewam û mandînenasane, şeva 25 li ser 26.07.2009'an, bi terzek serkevtiyane dawî bi karên xwe anî.

Di vê kongirê de rapora siyasî – civakî a pêşniyazkirî ji aliyê Komîteya Birêveberiya Giştî a hilbijartî ji aliyê kongireya çarem a vê saziyê, ji aliyê endamên beşdar ên kongrê ve hate pesendkirin.

Di beşek din a kar û barên kongirê de bername û pêrewa navxwe a pêşniyazkirî a nû kete berbas û piştî çendî civînên berdewam ên kongirê, ew jî hate pesendkirin.

Di beşek din a kar û barên kongirê de ku bona hilbijartina endamên birêveberiya nû hatibû terxankirin, di cewek demokratîk û azad de endamên eslî û cîgirên Komîteya Birêveberiya Giştî a nû hatin hilbijartin.

Bona agahdarbûna zêdetir ji çawaniya birêveçûna kongirê, kar û erkên kongirê, amancên wê, freq û cudahiyanê vê kongirê tevî kongirên din, encamên kongra nû û herwiha bername YCDKÎ bo pêşeroja ciwanên Kurd di Rojhilata Kurdistanê de, me hizr û rayên çend endamên kongirê wergirt ku emê li vir bixin ber çavên xwendevanên hêja ên duheftînameya Agirî.

Di bersîva pirsekê de li ser amadekarî û çawaniya birêveçûna kongireya pêncem,



**Dara Natiq,** Sekreterê hilbijartî ji aliyê Kongireya nû wiha got: Bi armanca amadekarî bo girtina kongireya

pêncem, komîteya birêveberiya berê,

sê mehan berî girtina kongirê komîteyên taybet pêk anî û wan komîteyan karên xwe dest pê kir. Di encam de roja pêncşem, 23.07.2009'an, Yekîtiya Ciwanan, pêncemîn kongireya xwe birêve bir. Endamên kongirê di cewek demokratîk û azad de û bi hestkirin bi berpirsariyê derheq pêşeroja ciwanan, beşdarî kirin, rexne girtin û pêşniyazên bi mifah xistine berbas.

Herwiha Dara Natiq di bersîva vê pirsê de ku we çima kongireya Pêncem bi navê "kongireya hogirên rêbaza Qasimlo" bi nav kir, dibêje: Pêncemîn kongireya ciwanan hevdem bû tevî 20'êmin salvegera şehîdkirina rêberê gelê Kurd, Dr. Edulrehman Qasimlo. Lewra YCDKÎ Îranê jî bona diyarkirina wefadarî û emegnasiya xwe bi rêbaza Dr. Qasimlo û rêzgirtin ji îrade û netirsiya ciwanan û xelkê Kurdistanê ku di roja 22'ê Pûşperê de bi awayên cur bi cur dest dan girevê û kiriyara han a rejîma Îranê mehkûm kirin, kongireya xwe li jêr navê "kongireya hogirên rêbaza Qasimlo" lidar xist.



Herwiha **Aware Celalî** yek din ji nûnerên kongirê, derheq beşdariya endamên kongirê li ser

mijarên cur bi cur dibêje: Bêşik endamên kongirê bi beşdariya xwe di basên cur bi cur de û bi diyarkirina têdîtinên xwe, dewlemendî bexşîna kongirê û ev kongire bi raya min kongireyek serkevî bû, helbet çavnehêriya min ji kongirê ji vê yekê zêdetir jî bû, lê bêşik kongireyek serkevî bû.



**Efrasiyab Giramî,** yekî din ji endamên kongirê li hember rapora kongirê got: Rapora kongirê bi hûrî bas ji encamên

hilbijartinên Îranê û tepeserkirin û

girtina xwenîşanderên Îranê kiriye û em weke Yekîtiya Ciwanan tepeserkirin û girtina hevweletiyên Îranê mehkûm dikin û ji aliyek din ve em bawerîn ku hilbijartin di Komara Îslamî a Îranê de bê wate û nedemokratîk e û tenê şanoyek e bona rakîşandina xelkê bo ser sindoqa dengdanê û berheqîdan bi desthilata xwe.

Yekîtiya Ciwanan, saziya hemû ciwanên şoreşvan ên Kurdistanê ye û bêşik kongirê jî ku bilindtirîn navenda vê saziyê ye, hewce ye ku xwediyê peyama û rasipardeyên cur bi cur bo ciwanan be. Di vê derbarê de.



**Elî Ebdîzade,** nûnerê endamên Yekîtiya Ciwanan li welat Swêdê dibêje: Kongireya pêncem a Yekîtiya

Ciwanan, di vê bawerê de ye ku ciwan wek çinek ku nifşek zaf ji civaka Îran û Kurdistanê pêk tîne, hêza sereke a guhertin û pêkanîna civakek pêşkevî û demokratîk e. Ciwan bi yekdengî û yekbûnê dikarin bibin zaminê serkevîna bizavekî xelkî û civakî di Îran û Kurdistanê de.



**Gelawêj Mêhrfer,** yek ji endamên ên beşdar di kongirê de derheq kêmasiyên


kongirê û cudahiya vê kongirê tevî kongirên din dibêje: Bi baweriya min kêmasiya vê kongirê eva bû ku nûnerên navxwe yên welat nekarîn beşdarê kongirê bin.

Lê ferq û cudahiya vê kongirê tevî kongirên din divegere bo ser girtina dema kongirê ku hevdem bû tevî 20'êmin, salvegera şehîdkirina Dr. Qasimlo, rêberê gelê me, lewma me kongireya pêncem bi navê "Kongireya Hogirên Rêbaza Qasimlo" bi nav kir.



# HÊVÎ

ADAR JIYAN  
adarjiyan@mynet.com



**H**êvî, pêbaweriya jiyane û rîkn û ripinê armanca hebûna mirov a ku rasterê bi jiyane ve girêdayî ye. Ku hêvî nemîne mebest û armanca mirov a ji bo jiyane jî namîne.

Tiştê ku jiyane bi mirov dide hezkirin jî hêvî ye. Tenê ne jiyane jî, hezkirin û rêzdanina mirovan jî girêdayî hêviyê ye. Tiştê ku mirovan arasteyî liv û bizavên erênî dike ji tevger û helwestên neyînî diparêze jî hêvî ye. Kirinên ku mirov wekî dost û yarenê xweşbîniyê û dijmin û neyarê reşbîniyê nîşan dide jî dîsa hêvî ye. Kesên ku di dil û mêjiyê xwe de hêviyê nehewînî nikarin tu mirovan li dora xwe vehewînî. Dîsa kesên ku hêviyê ne-ezîmînî (wekî mêvan venexwînî mala xwe) nikarin li qencyê biqesidin û merhebayê bidin başiyê. Lewre hemû deriyên başiyê pêşî bi kilîda hêviyê vedibin. Bi kurtayî kesên ku kilîda hêviyê winda dikin gêj û sewsî dibin. Serî li wan digere. Berxwe nabînin. Dilxweşî û aramî bi wan re namîne. Pêwendiyên wan diwêqin. Mexsed û armanca wan bi avê de diçe.

Jiyane li wan diherime. Cîhan li wan dibe zîndan. Hest û hizrên wan difetisîn. Behre û afirîndetiya wan ditepise. Coj û kelecana wan ditemire. Bixweewleyî û pêbaweriya wan dimire. Wate û azweriya jiyana wan dixese. Gul û kulîlkên wan diçilmisîn. Pelên wan ji darê diweşin.

Mirovên ku hêviya wan î jiyane dimire, dixwazin hêviya hemû mirovan jî bikujin. Binbariya peywireke wisa hildidin ser xwe. Û wekî jêvegirtineke erjeng li civakê belav dikin. Bi ya wan be dê xwe bi saxî têxin gorê û mirovên din jî li pey xwe. Di çavê wan de her kes û

her tişt xerab e. Tu başiyên ve dinê nîn in. Hebe tune be ew her tiştî dizanin. Her gav rastî ya wan e. Hemû bûyer û baweriyên jiyane li gorî rastiya wan şîrove dibin. Zana û aqildarên civakê ew in. Belê rasteqîniya jiyane tu carî wan eleqedar nake.

Bêhêvîti li aliyekî, hêvî ji bo mirov tê çî wateyê, divê bêtir ew were nîqaşkirin û nixandî. Wekî ku li jor jî hate diyarkirin, gava ku hêvî winda bibe, jiyane bi xwe ji dest diçe. Ru wate û mebesta jiyane namîne. Belê ku hêvî hebe, hemû nîrx û hêjahiyên jiyane bi serbilindî tene parastin. Kesên ku xwe ji bo mirov û civakê (û her wiha ji bo cîhan û mirovahiyê) berpîrsiyar û peywirdar dihesibînin, tucarî nikarin (û mafê wan jî nîn e) ku bi reşbîniyê li jiyane binihêrin û hêviya civakê bikujin. Ew neçar in ku hêvîdar bin û hêviyê belav bikin. An na nikarin ji bo dahatû û hebûna civakê têtikoşin. Her wekî din jî bêyî hêviyê tu tişt nayê bidestxistin. Pileya serkeftina serele hêvî ye.

Hemû rûdan geşedaniyên civakî bi saya hêviyê û bi destê kesên hêvîdar bi dest dikevin. Zanîn, zanayî û vedîtînen gerdûnî bi saya hêviyê pêk hatine. Nûjenî nûdemî û nûvedaniyên civakî bi hêviyê geş û gûr dibin. Demokrasî, aştî û aramî bi hêvî re xurt dibin.

Çawa ku mirovên hêvikuj (bêhêvî) civakê ditengjînin û mirovan çavreşî jiyane dikin û jiyane reşbîn nîşan didin, mirovên têtikoşer û hêvîdar jî mirovan dilxweş û şanaz dikin û jiyane xweşbîn nîşan didin.

Çendî ku xweşbîniya herî qels ji reşbîniya herî xurt watedardir e, hêviya herî qels jî ji bêhêvîtiya herî xurt baştir û erênîtir e.

## Kaniya Helbestan

### EW WÊNE



#### Çiya Mazî

Belê ev wêne bû ku rojekê min di rûpelê rojnemeyê de dît. Ev wêne bû ku porê min ji binî de tevizand û bedena min ricifand. Ev wêne bû ku di havîna 2000 î de tevî xwêdanê ez qefilandim.

Carinan hin tişt hene ku ne hewceyî mirov tîpekê jî li ser binivîsîne. Ne hewceyî mirov rave bike. Ji xwe ku mirov kurd be û li ser axa vî wêneyî bi jî û bûbe şahidê tabloyên wisa ne hewceyî şîrove û galgalên pir in. Dema ku min ev wêne di rûpelê rojnemeyê de dîtibû, devê min kilft bûbû. Tiştê tê bîra min çirkînî ji diranê min hatibû û min deng nekiribû. Tanê min rîhiştibû pênûsê û ev helbesta jêrîn ji pênûsê rijiyabû ser kaxezê.

Vêca ez jî li ser vî wêneyî şîroveyê nakim û helbesta xwe diyarî pakrewanên vî wêneyî dikim.

Hawaaar...hawar...!

Hawar li vî wêneyî nenêrin  
nizanim çend hebin em  
Û çend heb gulle li himber me  
Dikin me bikujin di rêzê de ez  
Nebînin gidî... ez çawa tîm kuştin  
Nebînin lawo... roja min çawa dihere ava  
Toz dixan tarî dibe tav  
Di gulle û namlûyan de  
Nexuya ye ji min ew toz  
Lê ji erdê tê erd dikele  
Teqîn û qêrîna hevalê min  
û ya yekî din  
erê! ne ez tenê me  
Xwîn nexuya ye ji çavên pêçayî  
Gelo wê gulle li ku min bikeve  
Diricifim  
Diperpitim  
Ditirsim  
Dinuqutim  
Birîndarim ji destê xwe  
Dimirim... dinalim  
Kî yê bera min bide nizanim  
Kîjan demê...çawa  
Kî yê bikişîne wêneyê min  
wê çawa be dema ez bimirim  
Kî yê karibe binêre li min  
Wê çawa porê xwe kur bike  
Bi ser min de diya min  
Kes ê bijî gelo ji kerban  
Jî şerman  
Bes bigirîn!  
faîl ne diyarim  
min bibînin bes  
(...)

## Di Bîranîna Mîr Celadet Bedirxan de Hola Dr. Nûredîn Zaza hat vekirin



**Konê Reş**  
**16/07/2009**

Di roja 15/07/2009'an de, bi helkeftina ku 58 sal bi ser koçkirina Mîr Celadet Bedirxan re derbas dibe, Partiya (PDKS), bi seroketiya mamoste Hemîd Derwêş û beşdarbûna cemawerekî baş ji Kurd, Erebb û Mesîhiyan hola Dr. Nûredîn Zaza hat vekirin. Di dawiya merasîma vekirinê de û bi helkeftina bîranîna 58 saliya Mîr Celadet Bedirxan, bi vê kurtejiyênîgariya wî min beşdarî kir. Belê di destpêkê de min hola Dr. Nûredîn Zaza li xelkên Qamişlo pîroz kir..

\* \* \*

Ez ne bawer im ku tu malbatan wek malbata Mîrê Cizîra Botan, Mîr Bedirxanê Azîzî, ji dil û can xebat û bizav di ber gelê kurd de kiribin, tev malê xwe û canê xwe di ber de winda kiribin.

Tevî ku neferên vê malbatê ji sala 1847'an ve, di koçberî û sirgoniyê de dijîyan, lê wan qet Kurdîstana xwe, warê bav û kalên xwe ji bîr nekirin, ji desthilanînê neketin, li ber xwe dan û gelek xebat û bizav kirin, da ku navê gelê xwe di nav gelên cîhanê de bilind bikin. Neferên vê malbatê di sirgoniyê de, di bin şert û mercên dijwar de, xwe berpirsyarê gelê xwe didîtin û kêşeya gelê kurd barê xwe yê yekemîn dinasîn, bi gotin û kirinê dixebitîn, çî di warê civakî û rewşenbîriyê de, û çî di warê siyasî û konevanî de, û wiha tev di sirgoniyê de dûrî xaka Cizîra Botan mirin. Û wek ku mamoste Hemîdê Derwêş, her dem dibêje: Cihê ku Bedirxanî lê bijîn, Kurdistan li wir e...

Her û her daxwaza wan pêşxistina gelê kurd û bilindkirina navê Kurdistanê bû û wiha wan Bedirxaniyan gelek komele û dibistan damezirandin, gelek kovar û rojname weşandin, hem jî bi saya wan gelek navend û enstîtu ji gelê kurd re hatine avakirin.

Îro roj 58 sal di ser koçkirina rêberê zimanê kurdî, mîr Celadet Bedirxan re deras dibe, ( 15/07/1951). Bi vê helkeftinê kêfxweş dibim ku em yadvegera koçkirina wî a 58 salî li Qamişlo pêk bînin. Hêjayê gotinê ku di sala 1952'an de, yekemîn car van herdu hevalên wî yên Asûrî Yûsif Melek

xwediyê rojnameya Esra û Avokat Mensûr Şalîta bîranîna wî li Şamê pêk anîne. Di sala 1953'an de, careke din kebanîya wî Rewşen xanim bi alîkariya Kurdên Şamê û nadiyê Henano li Şamê ew bibîr anîne. Di sala 1991'ê de me li Qamişlo 40 saliya koçkirina Mîr Celadet vejandin, va îro em 58 saiya wî di roja koçkirina wî de (15/07/2009), bi helkeftina vekirina hola Dr. Nûredîn Zaza bi bîr tînin.

Mîr Celadet Bedirxan li ser rê û şopa apê xwe (Miqdad Medhet Bedirxan) dilivîya, hawar û gaziya wî ji ya apê wî bû. Ew apê ku di roja 22'ê Nîsana 1898'an de, yekemîn Rojnameya kurdî li Qahîre weşandiye û di nav kurdan de bi belavkirin daye û di nav rûpelên wê de gazî kurdan kiriye û gotiye: **(Gelî mîr û axano, kurmancino ! qenc bizanin, xwendin, ilm û marifet li dinya û axretê rûyê mirov sipî dike ...Niho zaroyên xwe bi elîminin ilm û marifeta. Hûn bi xulaqeta xwe şucah û cesûrin. Hekê hûn bibin xweyî ilm, hûnê ji dinê hemiya xurtîr, dewlîmentîr bin..)**

Tiştêkî giring heye, pir bîr û baweriya min pê tê, ew jî ev e: Yê ku li kevnê xwe ne pîrse, lê neguhdarbe û neparêze, zore ku karibe di pêserojan de, tiştêkî durist û aktîv ji gelê xwe re pêşkêş bike. Vêca gerek em guhdariyê li vê yekê bikin, li wan mirovên xwe yên kevnar miqatebin û gelê xwe serwestî jîyan û xebata wan bikin. Fermo bi kurta hî jîyan û xebata mîr Celadet Bedirxan seh bikin:

Tevî ku mîrê dûmahîya welatê (Botan), mîr Bedirxanê Azîzî, di sirgûnê de li Şamê, di sala 1868'an de çûbû ber rehma Xwedê, lê Siltanê Osmanî rê neda kurên wî bi vegera warê bav û kalan " **Cizîra Botan**", piraniya wan kirin hakim, walî û paşa, lê li dervî welatê wan, da ku ji şer û bela wan xelas be...

Hingê " **Emin Alî**, bavê mîr Celadet kurek ji wan kuran bû, para wî bû hakimê cezayê li Stanbolê. Di wê hingê de, Xwedê kurek dayê, navê wî kir Celadet, ango sebir û saman, ji ber ku pir bi hêvî bû ku, wê tengayî xelas bibin û rojekê li welatê xwe Botan vegere.. Vêca sebir û saman dikîşand.. lê mixabin, ew hêviyên wî pêre çûne gorê, li cihêkî dûrî welatî wî bi gelekî, li Misrê, bajarê Qahîre, di sal 1926'an de. Lê kurê wî Celadet ew hêviyên bav û

bapîrê xwe, bi xwe re hilgirtin û hilanîn û di ber wan de xebitî ta roja dawî ji temenê xwe. Bi vî awayî Mîr Celadet bi welatparêzên kurdan re, bi bav, ap, pîsmam û birayên xwe re komeleyên kurdî yên pêşîn di Stenbolê de ava û saz kirin. Di sala 1914'an de, di eniya Qefqasê de, beşdarî di şerê cîhanî yê yekemîn de kir, ta ku giha Tewrêz û Bako...

Di sala 1919'an de, ew û birayê xwe Dr. Kamîran, Ekremê Cemîl Paşa û Faiyîq Tewfîq(Pîremêrd), ji Silêmaniyê di gel Mêcer Newêl yê Îngilîzî, li Kurdîstana Bakur gerîyan, da ku daxwazên gelê kurd nas bikin berî ku peymanasîverê bê morkirin di navbeva hevalbendan û dewleta Osmanî de. Di sala 1922'an de Mistefa Kemal Paşa fermanek deranî bi kuştin û sirgunkirina malbata Bedirxaniyan, vêca ji neçarî Tirkîye li şûn hiştin û bi şar û welatên dinyê ketin, ta ku ew û birayên xwe Kamîran, li Almanyayê bi cî û war bûn. Bavê wî Emîn Alî û birayê wî yê mezin Sureya (Dr Bileç Şêrko) xwe gihandin Misrê, bajarê Qahîre. Hingê Mîr Celadet li Almanyayê xwendina xwe di avokatîyê de bir serî û dest bi xwendina doktorayê kir. Lê dema ku seh kir şoreşa şêx Seidê Pîranî dest pê kiriye, di derhal de xwendina xwe li rexekî hişt û xwe bi şoreşê ve gîhand.

Mixabin ew şoreş ne di çax û demê xwe de dest pê kiribû û dawî bi hovîtî hat perçiqandin.. Mîr Celadet jî, polîpoşman careke din zîvirî Almaniya. Di sala 1927'an de Mîr Celadet û Memdûh Selîm Beg Wanlî, bi alîkariya Ermenyan, komela " Xoybûn" li Libnanê damezirandin. Bi beşdarbûna gelek welatparêz û serokên eşîrên mezin di Kurdistanê de wek: Dr. Şikîrî Segban, Memdûh Selîm Wanlî, Haco Axa, Emînê Perîxanê...hwd

Di sala (1929-1930) de xwe amade kirin ji şoreşa Agirî re, ku ji sînorê Sûriyê êrîşî tirkan bikin û bavêjin ser Mêrdîn, Midyad, Ûrfa û Cizîrê.. Daku akama artêşa tirkan li ser şoreşvanên Agirî sivik bibe. Lê sed mixabin wek ku Mîr Celadet û hevalên xwe dixwestin bi wan re neçû serî. Ji ber ku hingê axa û begên Binxetê xwe bixwe ji hev nerazî bûn û şerê hev dikirin. Vêca Mîr Celadet ji neçarî xwe bi şoreşa Agrî ve gîhand, da ku di şer de li kêleka Îhsan Nûrî Paşa û Îbrahîm Hesko Têlî be...

Lê sed heyf û mixabin, ew şoreş jî bi destê tirkan, bi tundî hat

qurmiçandin. Serokên wê jî, ji neçarî xwe li Îranê girtin û Mîr Celadet Bedirxan di gel wan.

Li Tehranê, Mîr Celadet bi şah Riza Pehlewî re rûnişt û doza alîkariya kurdan lêkir, lê şah Riza xwe neda ber tu tiştî, tiştê ku xwe da ber, ku Mîr Celadet bi ya wî bike û bibe şalyarekî bi kêfa xwe li dewleteke ewropî. Lê Mîr Celadet bi vê tevdira Riza Pehlewî razî nebû, vêca Pehlewî ew bi darê zorê ji tixûbên Îranê deranî û berê wî da Îraqê. Di wî çaxî de li Îraqê, hikûmeta Îngilîzî şerê kurdan dikir, dema Îngilîzan seh kir ku Mîr Celadet li Bexdayê ye, ketin hev û rêtengî jêre cêkirin. da ku ji Îraqê derkeve. Ji ber ku Mîr Celadet Bedirxan di wê hingê de wek sembolek bû ji netewiya kurd re. Û dawî ji neçarî Mîr Celadet ji Îraqê derket û careke din xwe li Sûriyê girt. Li sûrî jî, hikûmeta Firansî ya ku desthilat bû, dest danîn ser û ew şandin Şamê da ku di bin rûniştina zorê de be, wek piraniya Kurdperweran. Wiha mîr jî ket bin rûniştina zorê de li Şamê, di gel welatparêzên kurdan, serokên êl û malbatên mezin yên sirgunkirî wek Malbata Cemîl Paşa Diyarbekirî, Dr. Nafiz Zaza, Memdîh Selîm, Haco Axa û zarokên wî, Qedrî Can...

Di sala 1932'an Mîr Celadet bi serokên êl û eşîrên kurdan re, bi şêx, mellan û welatparêzan re komeleyek damezirandin bi navê: **Civata alîkariyê ji bona kurdên belengaz li Cizîrê**, nemaze ji bo wan kurdên ku ji Tirkiyê mişextî û sirgunî Binxetê bibûn û piraniya wan tazî û bircî bûn. Vêca ji bo alîkariya wan, ev civat hatibû avakirin û gelek malik li şar û gundên Binxetê hatibûn vekirin. Hingê serokê civatê li bajarê Şamê Dr. Ehmed

Nafiz Zaza bû û li bajarê Heskê Hesên axa Haco bû. Ji ber gelek sedeman ew civat jî pûç derket û mîr bê hêvî bû.

Mîr, rabû rêyek nû da ber xwe, ku bi tena xwe kovarekê bi zimanê kurdî (tîpên latînî) di nav kurdan de biveşîne, bi wê alfabêya latînî ya ku ji sala 1919'an de pê mijûl bibû. Wiha di roja 15.15.1932'an de hejmara pêşîn ji kovara xwe (**Hawar**) çap kir li Şamê û di nav kurd û biyanyan de belav kir û hawar û gazî kurdan kir û got:

**(Hawar dengê zanîne ye, zanîn xwenasîn e, xwenasîn ji mere riya felat û xweşiyê vedike. Hawar me berê her tiştî heyîna zimanê me dê bide naskirin lewma ku ziman şerta heyîne ya pêşîn e...)**

Ew cara pêşîn bû ku alfabêya kurdî latînî berdestî xwendevanên zimanê Kurdî dibe. Di gel kovara "Hawar" ê re, di roja 1/4/1942'an de, mîr Celadet kovareke din bi navê "**Ronahî**" xurû bi kurdîya latînî çap û belav kir.

Mîr Celadet bi bêtirî 15navan di van herdû kovarên xwe de dinivîsand. Ji ber ku kesên nivîskar kêr bûn û ne dixwest ku biyanî zanibin ew tenê, yan ew birayê xwe (Dr. Kamîran) tev babetên van kovaran dinivîsin. Di pey re Mîr Celadet nav di gelek kesan de dida, ew dehif didan ber bi nivîsandina zimanê kurdî. Di roja îro de gelek ji wan nav û deng dane wek: Cegerxwîn (mele şêxmûs ), Osman Sebrî, Qedrî Can, Mistefa Ehmed Botî, Hesên Hîşyar. Hingê jî, gelek kesên bi nav û deng di kovarên wî de nivîsandine wek: Goran, Bêkes, Ihsan Nûrî Paşa, Evdulrehmanê Eliyê Ünîs, Cemîlê Haco axa û hwd. Mîr Celadet di ber herdû kovarên xwe re pirtûkxaneyek vekir bi navê **Pirtûkxana Hawarê** û 20 pirtûk

çap kirin, dîwana Cegerxwîn a yekemîn: Pîrîsk û Pêt " yek ji wan e. Hem jî mîr Celadet pêşgotin ji vê dîwana Cegerxwîn re nivîsandiye.

Di sala 1935'an de mîr Celadet zewicîye diyare ku kebanîya wî **Rewşen xanim Bedirxan** e. Keçmama wî bû.

Ji zewaca wan kur û keçek li wan zêde bûye, kur navê wî "Cemşîd" e di sala 1939'an de çêbûye, doktor e di bijîşkiyê de, jiyana xwe li Almaniya derbas dikir, di sala 1999'an de li Barazîl çûye ber dilovaniya Xwedê. Lê keç navê wê Sînemxan e, kebanîya nivîskarê kurd (Selah Sadella ) ye niha li Hewlêr dimîne... Mîr Celadet bi van zimanan dizanî: tirkî – îngilîzî – firansî – farisî –rûsî-yûnanî- elmanî-erebî ji bilî ku zimanê kurdî zimanê dê û bavê wî bû, zimanê axaftina mala wî bû.

**Ji berhem û afirandinên Mîr Celadet Bedirxan:**

- 1-Rêzimana alfabêya kurdî, Şam 1932. ji berhem û afirandinên mîr Celadet Bedirxan:
- 2- Rûpelînine alfabê, Şam 1932.
- 3-Bîyîsa Pêxember. Şam1933.
- 4-Nevêjên Êzedyan Şam 1933.
- 5-Nameyek ji Mistefa Kemal Paşa re Şam 1934.
- 6-Li dorzoza Kurdistan ê, Misir 1943.
- 7-Giramêra kurdî, Şam 1943.
- 8- Giramêra kurdî-bi firansî
- 9-Sebebên rastiya ketina edivne
- 10-Ferhenga kurdî –kurdî
- 11-Ferhenga kurdî-firansî
- 12-Xwebinas
- 13-Kitêba sînemxanê
- 14-Hevind "şanoye"
- 15-Dîwanek helbest, çapnebûyî"

**Pirtûkek nû ji Şoreş Reşî**



**Karîkatorek ji Yehya Silo**



Avestakurd

## Li Îranê Rêjeya Nexweşên HIVê Zêde Dibe

► Nûçegihaniya Xwendekarên Îranê (ISNA) raporek nû derbarê serhejmariya nû a nexweşên HIV'ê li Îranê weşand. Di raporê de hatiye diyarkirin nêzikê 20 hezar nexweşên tûşbû bi ADIS'ê li Îranê hene ku nexweşiya wan pir xurt e.

Rapor dide eşkerekirin ev hejmare tenê ev qas e ku ji aliyê navendên dermanî û nexweşxaneyan ve hatine nasîn û eşkere bûne. Çavkaniyên ne fermî dibêjin statistîkên nexweşên HIV'ê ji vê yekê pir zêdetir in.

Rapora nû diyar dike, ji sedî 70 a wan kesan, bi rêya derziyên hevbeş ên bikarhatî di nav bengdaran (kesên madeyên bêhişker dikşînin) tûşî wê



nexweşiyê de.

Hejmara nexweşên HIV'ê li Îranê roj bi roj zêdetir ji berê eskere dibin.

## Şandina Benzînê Ji Bo Îranê Dikeve Ber Dorpêçên Navneteweyî

► Dorpêçên navnetewî bo şandina Benzînê ji Îranê re di rê de ne. Meclîsa Senate a Amerîkayê gelaleyek nû pejirand û



daxwaz ji şîrketên mezin ên petrolê kir ku Benzîn û berhemên din ên neftê nefiroşin Îranê. Ew gelale ji bo rêvebirinê pêwîstî bi pejirandina Meclîsa Nûneran û înzaya Serokkomar heyê. Li gor biryarê şîrketên ku Benzînê bifroşin Îranê, dikevin ber ceza û baykotên Wezaretê Enerjî a Amerîkayê. Armanca wê gelalê ya nû zextanî bo sekinandina xebatên navîkî ên rejîma Îranê ye.

Wezîra Karê Derve ya Amerîka, Hilari Klinton di vê derbarê de ragihand: "Em dixwazin baykûtên nû ên tund li dijî şandin û firotina Benzînê ji bo Îranê rêve bibin, ji ber ku Amerîka li xebatên Etomî yê Îranê, piştgiyariya wê rejîmê ji terorîzmê û wd... nigeran e û em dixwazin ku hevpeymanên me jî di vê proseyê de alîkariyê bikin."

Ev gelaleya nû a Meclîsa Senate a Amerîkayê şeva çarşem, 5'ê Tîrmeha 2009'an hate dan.

## Rêjeya Bêkariyê Gellek Ji Serhejmariyên Fermî Zêdetir E

► Di halekê de ku statistîkên fermî rêjeya bêkariyê li Îranê nêzikê ji sedî 15 nişan didin, lê karnasên civakî û aborî dibêjin, li gor pirsgirêkên kûr ên pêkhateya aboriya Îranê, rêjeya bêkariyê li wî welatî gelek ji ya fermî zêdetir e.



Nûçegihaniya MEHRê di raporekê de diyar kir ku rêjeya bêkariyê gelek ji ya ku Rêxistina Serhejmariya Îranê ragihandiye bêtir e, bi awayekê ku hejmara betalî û bêkariya ciwanên ku xwendina zanîngehê kuta kirine, ji sedî 25 e.

Mijara bêkariyê li Îranê babeteke cihê nîqaşê di hilbijartinên dewra dehem ya Serok Komariyê bû ku her berendamêkî serhejmariya yê din derew dida zanîn.

## Li Efxanistanê Jinan Kampaynek Ji Bo Xwestekên Xwe Pêk Anîn

► Ji bo beşdariya berfireh a siyasî a jinan, Jinên Efxanistanê çalakî û bernamêyê nû di çarçoveya kampanyekê de bo hilbijartinên Serok Komariyê û Şêwrên Wilayetan dest pê kirin. Hejmarek ji çalakên mafên jinan li wî welatî namîlkeyek amade kirine û tê de xwestekên xwe anîne rojevê. **Kampayna 50 %** navê hevberdiyeke çalakên



mafê jinan e ku bo wê armancê kar dike. Li gor gotina wan çalakên mafê jinan, jin nîva civakê û herwiha nîva dengederên Efxanistanê pêk tînin û berbjarên hilbijartinên Serok Komariyê divê ji bo bîdestxistina dengê wan xwestekên jinan berçav bigirin.